Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1242 | 26-Çile-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Pirtûkek penaberiyê ya têkoşîna jinên Mexmûrê hat çapkirin

**Navenda Nûçeyan**

**Komîteya Jineolojiyê ya Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî ya Mexmûrê pirtûka xwe ya bi navê “Li Mexmûrê penaberiya jinê û navendên berxwedanê” çap kir.**

Xelkê Botanê ku di sala 1994’an de ji ber zextên dewleta Tirk koçî Başûrê Kurdistanê bûn, di dema koçberiya Başûrê Kurdistanê de 7 war guhertin û di warê heştemîn de li wargeha Mexmûrê bi cih bûn. Di dema koçberiyê de rastî hemû şêweyên êrîşên dewleta Tirk a dagirker û PDK’ê hatin. Riya koçberiyê ji bo wan bûbû riya mirin û berxwedanê. Mirin, talan û dûrketina ji xakê li pêşiya wan bû lê wan îxanet û bêrûmetî qebûl nekirin û bûn koçberên hêviyê.

Ji bo vegotina penaberî, êş û berxwedana gelê Botanê bi taybet jî ya jinên Botanê ku 30 salin li beramberî hemû cûre êrişan li ber xwe didin Komîteya Jîneolojiyê pirtûkek ya penaberiyê bi navê “Li Mexmûrê penaberiya jinê û navendên berxwedanê” nivîsand û çap kir. Bi giştî di pirtûkê de mijarên wek; kurtedanasîna herêma Botanê û taybetmendiyên herêmê, rewşa civakî ya jinan li herêmê, têgîna penaberiyê, di rastiya penaberiyê de, sedemên penaberiyê, di nava xeleka penaberiyê de rista jinan, serpêhatiyên jinên wargehê, polîtîkeya avakirina meclis û sekna jinan, avakirina qadan, nêzîkatiyên li hemberî keda dayikê, xeyalên jinan ên pêşerojê û vegera welat û di dawî de jî derencam cih digre. Komîteya Jineolojiyê bi armanca, berxwedana gelê wargeha Mexmûrê, bi taybetî berxwedana jinan, sekna wan a di dema koçberiyê de êşên ku jinan kişandine, xwerêxistinkirina jinan û hwd…pirtûk nivîsand û çap kir. Songul Guler endama Komîteya Jineolojî yê der barê armanca Komîteya Jineolojiyê ya ji nivîsandina pirtûka penaberiyê de got:

**‘Me xwest em çanda berxwedanê ya wargeha Mexmûrê careke din belge bikin’**

Songul Guler di destpêka axaftina xwe de armanca Komîteya Jineolojiyê ya ji bo nivîsandina pirtûkê wiha anî ziman: “Mirov dikare bibêje dîroka wargeha penaberan a şehîd Rustem Cûdî tenê bi gotin yan jî mijarekî anîne ziman zehmet bû. Rêwîtiya 28 salan a wargeha Şehîd Rustem Cûdî gelek caran hat ziman, belgefîlm li ser hat çêkirin, axaftin hatin kirin, pirtûk hatin nivîsandin, nîqaş hatin kirin. Lê em dikarin bibêjin bi temamî bi taybetî jî di aliyê jinanê de ew rêwîtiya 28 salan çawa derbas bû, roj bi roj, meh bi meh, sal bi sal çawa derbas bû? Wan dayikan di nava 28 salan de jiyanek çawa di nava koçberiyê de dan avakirin, debara xwe çawa kirin, zarokên xwe çawa xwedî kirin, pergala xwe çawa dan avakirin, di nava vê de rêxistinên xwe çawa avakirin? Beramberî dagirkeriyê, şert û mercên jiyanê çawa têkoşiyan, li beramberî zihniyeta baviksalarî jiyanek çawa dan meşandin? Pêwîst bû ev hemû tişt bên lêkolîn kirin, berê hatibû lêkolîn kirin û nivîsandin. Lê me wek Komîteya Jineolojî ya wargeha Mexmûrê pêwîst dît ku çanda berxwedanê ya di wargeha Mexmûrê de hatibû avakirin bi hemû aliyê xwe ve divê careke din were lêkolîn û belge kirin.”

**‘Min careke din dît û fam kir ku dayikên Kurd wek pola ne’**

Songul Guler destnîşan kir ku dema wan serpêhatiyên jinên wargehê lêkolîn dikirin ew ji sekna wan û çîrokên wan bi bandor bûne, hêz girtine û wiha got: “Ji ber wê jî ev pirtûka ku me wek Komîteya Jineolojî nivîsiye me ne tenê aliyek girtiye dest. Me hemû aliyên jiyanê girt dest, ji çanda berxwedaniyê bigre heta sekna jiyanê, me aliyên wê yên civaknasî, aborî, çand, ziman, polîtîk jî girt dest. Ji serpêhatiyên dayikan bigre heta di nava malê de liv û tevgerên wan. Bi giştî lêkolînek wisa hat kirin, di van lêkolînan de çîrokên pir bi êş, giran, ezmûnên jiyanê ku mirov bikare jê gelek tiştan fêr bibe û têkoşînên



bêhempa re em rû bi rû man. Em careke din gihîştin wê encamê ku dayikên Kurd wek pola ne, beramberî ewqas zilm û zorî, êş û giraniyê de hê jî em dikarin bibêjin wek çiyayên Kurdistanê li ser lingan mane. Ev ji bo me tevan bû coş û kelecaneke mezin û bû çavkaniya hêz û hêviyê ji bona tecrubeyên jiyanê. Me jî got divê ev wisa vala neçe û li tenê di warê gotinê de nemîne.

**‘Me got pêwîst e berxwedana gelê wargehê careke din were belgekirin’**

Guler, di nirxandinên xwe de anî ziman ku kesên ku tu caran wargeh ne dîtine dikarin bi pirtûka wan wargehê nas bikin û got: “Wek tê zanîn di çand û dîroka Kurdan de mixabin ji ber ku her tim dibin dagirkeriyê de tu caran kiryarên wan yên jiyanê, dîrokî, felsefî, çîrokî û destanî nehatiye belge kirin. Me got pêwîste wargeha Şehîd Rustem Cûdî jî ger ku çandekî berxwedanê bi vî şêwazî daye ava kirin, pêwîste were belge kirin û me pirtûka xwe li ser vî esasî nivîsand. Kesên ku ji derve qet wargeh ne dîtine, pêzanînin wan li ser wargehê nîne dikarin bi vê pirtûkê wargehê baş nas bikin.”

**‘Cara yekem e wek jinên wargehê me pirtûka xwe nivîsandiye’**

Songul Guler di dawiya axafina xwe de diyar kir ku wan pirtûka nû çap kiriye û ew hewl didin ku pirtûka wan li her derê belav bibe û wiha got: “Me pirtûk nû çapkiriye, em niha hewl didin van pirtûkan hem bi kesên ku me li gel roportaj kirine, yên ku çîrokên xwe anîne ser ziman bidin wan, hem jî li hemû dayîkên wargehê, saziyên wargehê, yên ku ji derve bixwazin re belav bikin. Ji ber ku hîna nû gihiştiye destê me em kelecana wê jiyan dikin. Cara yekeme wek jinên wargehê me pirtûka xwe nivîsandiye. Coş û kêfxweşiyeke mezin jî dide me, em ê bi vê kelecanê pirtûkên xwe belav bikin û em di wê baweriyê de ne ku ew dayîkên ku pirtûkê bigrin wê hem xemgîn bibin hem jî kêfxweş bibin. Êdî serpêhatiyên wan jî dibe belgeyek û dikeve dîrokê, herî kêm ked û têkoşîna wan nayê winda kirin û em bawer dikin wê dayîk bi derketina vê berhemê re dilşad bin.”

## Bi tembûra xwe hunera resen diparêze



**Navenda Nûçeyan**

Di demên dawî de li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek ciwanên behremend di warê stran û muzîkê û beşên din ên hunerê de derketin ku jêhatîbûna ciwanan nîşand dide. Her wiha dibe egera parastin folklor û kelepora herêmê. Navendên çand û hunerê jî piştgiriya van behremendan kir.

Ciwanê bi navê Mihemed Umer ê 16 salî yek ji wan behremendan e ku ji zarokatiya xwe ve dest bi rêwîtiya xwe ya hunerî kiriye. Umer li bajarê Dirbêsiyê ji dayik bûye, lê dema ew biçûk bû malbata wî çû bajarê Amûdê yê kantona Cizîrê û ew jî li wir mezin bû.

Mihemed ji salên xwe yên destpêkê ve ji lêxistina tembûrê hez dikir, malbata wî, bi taybetî dapîra wî piştgiriya wî kir. Berî 5 salan, ew tev li Navenda Tevgera Çand û Hunerê ya Amûdê bû û jêhatîbûna xwe di lêxistina tembûrê de bi pêş xist, her wiha bi alîkariya hunermend û mamosteyên muzîkê li navendê karîn û behremendiya xwe ya stranan jî bi pêş xist. Umer dibêje ew spasdarê piştgirî û alîkariya mamosteyên xwe ye.

Mihemed bi alîkariya hunermendekî li bajarê Qamişlo vîdeoklîba xwe ya yekem weşand, di wê stranê de banga mayîna li welat dike. Mihemed Umer bi hêvî ye ku di warê stranbêjî û muzîkê de behremendiya xwe bi pêş bixe, da ku bikare mohra xwe li cîhana muzîk û hunerê bihêle.

Sudoku: Bersiv 24

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 5 | 1 | 8 | 3 | 4 | 7 | 2 | 9 |
| 3 | 8 | 7 | 6 | 2 | 9 | 5 | 4 | 1 |
| 4 | 9 | 2 | 5 | 1 | 7 | 3 | 8 | 6 |
| 1 | 2 | 4 | 9 | 8 | 3 | 6 | 5 | 7 |
| 8 | 6 | 3 | 7 | 5 | 1 | 2 | 9 | 4 |
| 9 | 7 | 5 | 4 | 6 | 2 | 8 | 1 | 3 |
| 2 | 3 | 9 | 1 | 7 | 5 | 4 | 6 | 8 |
| 7 | 1 | 8 | 2 | 4 | 6 | 9 | 3 | 5 |
| 5 | 4 | 6 | 3 | 9 | 8 | 1 | 7 | 2 |

Sudoku:Pirs 25

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | 2 | 4 | |
| 7 | | | | 5 | | | | 8 |
| 2 | 4 | | 3 | 8 | | | 6 | |
| | | | | 7 | | 9 | 8 | 1 |
| | 7 | | | 9 | | | 3 | |
| 8 | 9 | 6 | | 3 | | | | |
| | 8 | | | 4 | 6 | | 7 | 3 |
| 6 | | | | 1 | | | | 2 |
| | 1 | 5 | | | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Vala ye:**
- Tiştekî nizane; ne bêaqil e.

**Xwe avêt çalê:**
- Bêhêşî kir; guhê xwe neda ti kesî.

**Xwe diavêje çalê:**
- Bi heman wateyê.

Yê ne li govendê xweşreqas e.
- Nezan e; haya wî ji mijarê nîne.

**Zad û zîwanê tevlîhev dike:**
- Tiştan xirab dike; karê dike bi kêrî tiştekî nayê.
- Nizane biaxive.

**Zarokê doh e:**
- Nezan e, bêhiş e.

**LI SER ÇARESERIYÊ**

**Av li agirê wî kir:**
- Hêrsa wî jê bir; hêdî kir.

**Belaya wî ji xwe vekir:**
- Ji bo ku ji xwe dûr bixe tiştek dayê.
- Pirsgirêk çareser kir.

**Bizmar kir:**
- Çareser kir.

**Bû weke çira şîr:**
- Pir xweş bû; pir baş çêbû; pirsgirêk tê de neman.
(Dema karek pir bi dilê yekî çêdibe hingê dibêje)

**Cotê Hemanê Gemo ye:**
- Karê wî bêserûber e; ji kar fêm nake.
(Hemanê Gemo cotyarekî nezan bûye)

**Cotê gayê seqet e:**
- Bi heman wateyê.

**Deriyek vebû:**
- Çareyek hat dîtin.

**Dijmin bi kuştinê rê bi biwartinê:**
- Rizgariya ji dijmin bi kuştina wî û rizgariya ji rê jî bi rêveçûnê dibe.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 26’ê Çileya 2015’an roja rizgarkirina cîhanê ji hovîtî û tarîtiyê ye



Piştî 5 mehan ji berxwedaniya li dijî hovîtiya çeteyên DAIŞ’ê, di kêliya ku hat gotin; “Va ye Kobanê dikeve” gelê Kobanê, şervanên YPJ û YPG’ê bi berxwedaniyeke bêhempa nefes li çeteyan çikandin pê re jî şikandina dîrokî ya çeteyên DAIŞ’ê dest pê kir.**R-5**

## ‘Bi Şerê Gelê Şoreşgerî em ê mayîndeya şoreşa xwe misoger bikin’



**Fermandara YPJ’ê Nisrîn Ebdullah diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker bi hemû hêza xwe êrişî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û hewil dide wê dagir bike, lê şervanên me di çeperên şer bi sekna xwe dîrokê dinivîsin.R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1242 | 26-Çile-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Dewleta Tirk girtin û qetilkirina rojnamevanan rewa dike



Rojnamevan Naz Roza Ozek diyar kir ku Ragihandina Azad di eşkerekirin û deşîfrekirina raştiya şer û siyaseta qirker de roleke sereke lîst û dilîze. Herwiha dewleta dagirker û rayedarên wê ewqasî aciz û bêçare dimînin, lewma jî rojnamegeran dikin hedef.**R-4**

# EM JI MIRINÊ MEZINTIR IN

Bendava Tişrînê ku îro weke bendava şehîdan û berxwedanê tê naskirin, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ji 8’ê Berfanbara 2024’an ve, bi awayekî hovane êrişî Bendava Tişrîn û pira Qeraqozaqê dikin. Di wan êrişan de gelek berdêlên giranbuha hatin dayîn. Şervan û gelê ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijîn bi felsefeya “Em ji mirinê mezintir in” bi têkoşîna xwe li ser rûpelên zêrîn dîrok nivîsandin.**R-3**




## ‘Rojava axa me ye, warê berxwedan û şehîdan e’



Rojnamevan Bîlal Gûldem da zanîn ku gelê Bakur, ji Silopiya heta Nisêbînê, ji Nisêbîn heta Hatayê xwedî li gelê Rojava, berxwedan û destkeftiyên gelê kurd û hemû pêkhateyan derket.**R-6**



**Bêalîbûn; gayê zexel e timî li mexel e**
Idrîs Henan R-5



**Ruhê Berxwedana Tişrînê Qonaxek Nû ye!**
Ahmet Aktaş R-4

## ‘Armanca dewleta Tirk parçekirina civakê ye’



Dagirkeriya Tirk hemû hewildanên xwe dike, da ku xaka Sûriyê dagir bike, pirojeya Netewa Demokratîk hilweşîne û îradeya gelê kurd bişkîne. Dagirkerî şerê taybet bi kar tîne, ji bo ku bi siyaseta xwe ya qirêj bandorê li hişmendiya civakê jî bike.**R-7**

# ‘Bi Şerê Gelê Şoreşgerî em ê mayîndeya şoreşa xwe misoger bikin’

Fermandara YPJ’ê Nisrîn Ebdullah diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker bi hemû hêza xwe êrişî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û hewil dide wê dagir bike, lê şervanên me di çeperên şer bi sekna xwe dîrokê dinivîsin û bi şerê gelê şoreşgerî dest bi vê şoreşê kirine û ew ê bi şerê gelê şoreşgerî mayîndeya şoreşa xwe misoger bikin.

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

Di derbarê berxwedaniya ku hêzên leşkerî li bendava Tişrînê dikin û armanca dagikeriya Tirk ji hedefgirtina wê ji bendavê re Fermendara YPJ’ê Nisrîn Ebdullah bersiva pirsên Rojnamya me da, hevpeyîvîn wiha bû:

**Êrişên Dewleta Tirk a dagirker li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewamin û bi taybet di vê dema dawî de êrişî bendava Tişrîn û pira Qereqozaqê dike, armanca dagirkeriyê ji van êrişan çiye?**

Ji destpêka Şoreşa Rojava ve heya roja îro êrişên dagirkeriya Tirk li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewamin. Di her pêvajoyekî de bi bihaneyên vala êriş dike, di heman demê de ji 27’ Mjidarê ve êrişîn wê li ser bendava Tişrîn û pira Qereqozaqê dest pê kir û heya roja îro jî berdewame. Pêvajoya rewşa Sûriyê hat guhertin lewma pêwîstî hebû ku em rê li pêşiya van êrişan bigrin. Hertim armanca dewleta Tirk ya bingehîn dagirkerî bû û bi dagirkirina Efrîn, Girê Spî û Serê kaniyê hat diyar kirin ku armanca wê parçekirina Sûriyayê ye. Carek din sînorên Osmaniyan ji nû ve li ser rûyê erdê pêk bîne, ev yek di êriş û dagirkeriya ku destpêkirî ji 27’ê Mijdarê ve xuya dibe. Dewleta dagirker û çeteyên wê him êrişî bendava Tişrînê dikin û him jî berê xwe didin aliyên Şamê jî ji xwe armanc zelale ew jî dagirkeriye û ev yek bi şêwaz û rêbazên cûda tê meşandin. Ev rêbazên ku dagirkeriya tirk dide meşandin dixwaze bi vê yekê ne tenê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagirbike, herwiha tevahiya axa Sûriyê dagirbike. Herêma ku li ber plana dagirkeriya tirk li ber xwe dide herêma Rêveberiya Xwesere û ji bona vê yekê dagirkeriya tirk û çeteyên girêdayî wê her tim berê xwe dane vê rêveberiyê û dixwazin destkeftiyên ku pêkhatine ji holê rakin. Ji ber ku pergala xweseriyê bi xwere gelek pêşketin pêkanîn û bû nimûne ji bona tevahî Sûriyê û cîhanê û ji bona parastina vê rêveberiyê û sistemê gel li ber xwe dide û rojana bedelên giranbuha dide.

**Dagirkeriya Tirk hewildanên xwe dike ku baragihên xwe li bendava Tişrînê avabike, lê meclisa Minbic a leşkerî, QSD, YPG û YPJ’ê bi berxwedaniya xwe ev hewildan têk birin hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Dewleta Tirk hemû derfetên xwe yên leşkerî, rêveberî, ekonomî û MÎT’ên xwe hemû kirine di bin xizmeta vê dagirkirinê de, bi taybet jî ev êrişên ku niha li bendava Tişrînê û Qereqozaqê têne meşandin û hemû teknîkên moderin a Nato li vê herêmê tên bikar anîn. Di heman demê de dagirkeriya tirk baragihên xwe yên leşkerî di herêmê de dide avakirin û heta niha du dane çêkirin, yek li aliyê Qereqozaqê ye ya din jî li aliyê bendava Tişrînê ye. Her wiha dagirkerî ji bo xwe wek bihaneyekî dîtiya ku çi erda ku leşkerê wê li ser meşiya ew erda wêye. Li hemberî vê dagirkeriyê li hemû qadan berxwedanî tê kirin, çi di qada leşkerî, siyasî û rêxistinî de be, di heman demê de têkoşîn û berxwedaniya gel jî bi vîneke xurt tê meşandin. Bê guman QSD di nav de YPJ, YPG û Meclisa Minbic a leşkerî bi sekneke dîrokî helwesta xwe nîşandidin. Li ser vê erdnîgariyê destanên serkeftinê tên jiyan kirin, her hevalek di çepera şer de destanekî temsîl dike, bi rihê xwe yê şoreşgerî û bi îradeye ji pola tevî hemû şert û mercan careke din soza ku ji şehîdan, gel û ji bo doza azadiyê re hatî dayîn bi sekna xwe îfada van hemûyan dikin. Her tim şervan bi rihê ku em ê serkeftinê misoger bikin şer û parastinê dikin, bi israrin ku çi bibe bila bibe em ê herêma xwe biparêzin, ji ber ku di wê ferqê de ne ku parastina herêmê parastina şoreş, welat û parastina nirxên şehîdane.

**Di çeperên berxwedaniyê de zarokên hemû netewan kom bûne û li dijî dagirkeriyê têkoşînê dikin, ji bona ku êriş werin rawestandin rola ku dikeve ser milê gelên herêmê çiye?**

Di van çeperên berxwedaniyê de careke din rengê Şoreşê îfadeya xwe kir ku zarokên hemû pêkhateyan li vir bi erkê xwe yê welatparêziyê û şoreşgeriyê radibin. Vê seknê da raber kirin ku û destkeftiyên şorşê, pêwîste rengê xwe bide tevahî şorşa Sûriyê û bide pergala ku were avakirin jî, ew rengê netewa demokratîke ku di çeperên şer de îfadeya xwe dike. Ev rihê yek netew nahêle dagirkerî riya xwe li xaka me bibîne, ev têkoşîna ku tê meşandin li hemberî çeteyên ku armanca wan dagirkirina cîhanê bi giştiye. Dewleta Tirk hemû derfetên xwe dide pêşiya bikaranîna terorîzma DAIŞ’ê û rê li pêşiya wê veke, lê serkeftina ku îro roj di çeperên şer de çêdibe ev serkeftin ji bo cîhanê hemû yî ye. Îro pirsgirêkên ewlekariyê li giştî cîhanê hene li beramberî terorîzmê, lewma pêwîste civaka Navdewletî jî bizanibe ku piştgiriya vê têkoşîn û berxwedaniyê wê piştgiriyê ji ewlekariya xwe re bike, ji ber ku ewlekariya vir ewlekariya tevahî cîhanê ye.

**Pêwîste ku li her gund, tax, bajarok û bajaran gel li ser bingehê şerê gelê şoreşgerî xwe bi rêxistin bike.**

Bê guman me bi şerê gelê şoreşgerî dest bi vê şoreşê kir û em ê bi şerê gelê şoreşgerî serkeftin û mayîndeya şoreşa xwe misoger bikin. Gelê me heya niha pêşengiya vê şoreşê dike û ji ber ku îro roj roja têkoşîn, berxwedan û parastina destkeftiyên ku bi xwîna şehîdan pêkhatine ye. Ev pêvajo ji hemû pêvajoyan cûdatire, ev pêvajoyeke giştiya û pêwîste ku em bi giştî di nava kar û xebatê de bin û ji 7 salî heya 70 salî pêwîste bê erk nemînin û biserkeftî erkê xwe pêk bînin. Ji ber ku heger em karibin erkê xwe biserkeftî pêk



bînin wê demê em ê ewlekariya vî welatî jî misoger bikin. Pêwîste bi vî hestî berpirsiyartiya me pêş bikeve, me 14 salan têkoşîn da meşandin û gel hertim banga wan ji bona rastî û heqîqetê hebû û ev yek di sekna xwe de nîşandan. Ji niha û şûnde ji hemû deman zêdetir em mafdarên û pêwîste ku em bi hemû derfetên di destê xwe de li destkeftiyên xwe xwedî derkevin. Ji ber ku me bi hezaran şehîd dan da ku em bikaribin rûmet, ax, civaka xwe biparêzin. Niha jî em amadene ku canê xwe feda bikin da ku em bikaribin nirxên xwe biparêzin, gelê me sozdarê vê yekêye. Di heman demê de em ê hewil bidin ku milên xwe yên kêm temam bikin, divê herkes vê dozê bigre ser milê xwe û bi rihê berpirsiyartiyê tev bigere. Ji ber ku ev êrişên ku tê kirin ne tenê li ser gelê kurd tê kirin, di heman demê de li ser giştî gelê Sûriyê ye. Lewma divê hemû netew bi vî erkî rabin û di wê baweriyê de bin ku serkeftina me ya di çeperên şer de misogeriya welatekî azad û demokratîk e.

# Enîta Lame ya Nepalî cil û bergên Kurdî didirû

**Navenda Nûçeyan**

**Enîta Lame ya Nepalî 5 sal in li Silêmaniyê dirûtina cilûbergên Kurdî dide wiha axivî: “Bandora çanda Kurdî li ser min heye. Cêwaziyek zêde navbera çanda Kurdî û Nepalî nîne.”**



Jina bi navê Enîta Lame (29) ya ku ji Nepalê ye, 11 sal in li Başûrê Kurdistanê dijî. Enîta Lame niha li bajarê Silêmanî dijî û karê dirûtina cilûbergan dike. Enîta Lame li ser çîroka hatina xwe û karê xwe axivî. Lame anî ziman ku ji sala 2013’an ve li Silmaniyê dijî û got: “Piştî ku sala 2019’an zewicîm, li gel ciwanekî Kurd fêrî dirûtina cilûbergên Kurdî bûm û li gel hevjînê xwe dikanek danî. Ev bû 5 sal li Silêmanî karê dirûtinê dikim. Girîngî didim dirûtina cilûbergên Kurdî û Hindî. Birîn û dirûtina cilûbergên Kurdî ji yên Hindî hêsantire ji bo wê girîngiyek hîn zêdetir didin cilên Kurdî.”

Enîta Lame diyar kir ku dema biryara zewacê daye, Hîtler naskir û biryar dan ku bi hev re bijîn. Lame anî ziman ku xelkê Kurdistanê piştgiriya jinan dikin ji bo ku kar bikin, pêşî lê nagirin û ev anîn ziman: “Bandora çanda Kurdî li ser min heye. Cêwaziyek zêde navbera çanda Kurdî û Nepalî nîne.” Pir kêfxweşim ku li Başûrê Kurdistanê dijîm. Mixabin ji ber paşketina mûçe jiyana welatiyan zêde baş nîne, ji bo wê ye ku welatê xwe diterikînin. Her wiha nedayîna mûçe bandorek li bazar û karê me jî dike.”

Lame daxwaz ji jinên Kurd kir ku bibin xwedî aboriyeke serbixwe û got: “Derfetên kar ji bo xwe bidin avakirin û kêrhatiyên xwe zêdetir bikin.” Enîta Lama qala cilûbergên Hindî jî kir û ev anî ziman: “Qumaşên ji bo cilûbergên Hindî ji Hindistanê tînim, nirxê wê jî pir erzane. Destek cilên Kurdî piştî 4 saetan diqede. Ew kesên sardana dikanê dikin, zêdetir daxwaza cilûbergên Kurdî dikin. Hîtler Heval têkildarî karê hevjîna xwe vê dibêje: “Tim piştgirî û piştevaniya hevjînê xwe dikir, ji bo bi heskirin karê dirûtinê bike. Armanca min jî ew bû ku bibe xwediyê karê xwe.”



# ‘Armanca dewleta Tirk parçekirina civakê ye’

Dagirkeriya Tirk hemû hewildanên xwe dike, da ku xaka Sûriyê dagir bike, pirojeya Netewa Demokratîk hilweşîne û îradeya gelê kurd bişkîne. Dagirkerî şerê taybet bi kar tîne, ji bo ku bi siyaseta xwe ya qirêj bandorê li hişmendiya civakê jî bike.

**Berçem Silêman/Qamişlo**

Di derbarê siyaseta dagirkeriya Tirk li ser herêmê û parçekirina civakê Helbestvan û Şanoger Beşîr Mele Newaf bersiva pirsên Rojnameya me dan, hevpeyvîn wiha bû:

**-Hûn siyaseta dagirkeriya Tirk a şerê taybet ku dixwaze tevilheviyê di nava gelên herêmê de derxe çawa dinirxînin?**

Yek ji hêmanên ku dagirkerek yan jî xwînmijek karibe miletekî dagir û talan bike, ji hevxistina civakê ye. Ji bo tu miletekî vala bixî ji çand, nasname û ji nirxên wê, wê demê bihesanî dikare wî dagir jî bike. Bi taybet dewleta Tirk xwedî ezmûneyên gelekî ziravin di dîrokê de, him ji bav û bapîrê xwe hîn bûye û him jî ji gelek dagirkerên nûjen jî ev hêman girtiye. Her wiha ji bo Rojavayê Kurdistnê bi taybet destwerdana dagirkeriya Tirk ji sala 2014’an û vir de pilan û pirojeyên wê eşkere bûn. Dewleta Tirk destpêkê bi rêbazekî ne yekser destwerdan di hundirê Sûriyê de kirin, dema dît ku tecrûbe û ezmûna Rêveberiya Xweser bilind bû li hemberî wê jî hewqasî destwerdanên xwe zêde kirin. Komên DAIŞ derbasî Rojavayê Kurdistanê kirin, mebesta wî ew bû ku pirojeya Rêveberiya Xweser têk bibe û kurdan ji holê rake. Di heman demê de dema rêjîma Sûriyê hilweşiya êdî gomanên dewleta Tirk bêtir mezin bûn ku wê kurd bikevin destûra sberoja Sûrî de. Careke din niyetên xwe yên xirab derxistin ku êrişî Şehba,Til rifet û Helebê kirin û ragihandina erebî jî heya astekî pêre bû alîkar, ku tevlîheviyê çêbike û tiştên ku ev 10 sal in ku li ser hêmanê hevjiyana azad û biratiya gelan a ku hatiye avakirin were hilweşandin.

**-Ji destpêka Şoreşa 19’ê Tîrmehê ve û heta roja îro sîstema Rêveberiya Xweser isbat kir ku bi hevgirtina gelan li ser bingeha Netewa Demokratîk çareserî di pêşeroja Sûriyê de pêkan. Ji bo ev sîstem bibe çareserî pêwîste çi were kirin?**

Pirojeya netewa demokrat tiştek nûye ji cem Rêber Apo derket,



piştî pêvajoya Êmralî. Heger em ji aliyê tewrî li vê pirojeyê binêrin, ev pirojeyeke erêniye lê li hemberî wê gelek bertek hene. Bi taybet li devereke ku bi demên borî ve girêdayî ne, di bin îdiyolojiya misilmantiya kevin de ye. Lewma rewşên demokratiyê û biratiyê ne bi hêsanî tê rûniştin, lê ji bo me kurdan ji ber ku di cîhanê de ne naskirîne. 70 melyon rêjeya miletekî heta niha nensa kirî ji hêla Netewên Yekbûyî helbet wê vê pirojeyê ji bo xwe bingeh bigre. Ji bo kurdan heya ku bibin xwedî hêmanek û hêzek bi destê wan bikeve, ew hêz jî mafdariya me de ye. Bi riya mafdariya me em ê karibin van tevin û sîwanên reş yên ku li ser me hatine vedan têkbibin. Di heman demê de bi giştî ev rêjîmên ku Kurdistan dagirkirine miletê xwe yê belingaz bikar tînin wek enerjî da ku kurdan bi çewisînin, lewma yek ji hêmanên guncaw ku em bikaribin mafên xwe biparêzin û doza xwe bi wan bidin naskirin bi riya Netewa Demokrat û biratiya gelan e. Her wiha ev piroje ji destpêka şoreşa 19’ê Tîrmehê ve li Rojavayê Kurdistanê hatiye pêkanîn û helbet ev piroje vekiriye ji guhertin û veguhertinan re li gor rewşên heyî.

**-piştî ketina rêjîma Baas û di rewşa heyî de ku Sûriyê tê re derbas dibe, pêşbîniyên we çi ne?**

Di salên 1945’an heya 1960’î kêferat û gengaziyek hebû ku Sûriya ber bi dewletek demokrat ve here, lê hizrên netewperest ên ku ji derdorê hatin, ew bûn astengiyên herî mezin di pêşketina hêviya ku Sûriya bibe dewleteke demokrat. Lê bi hatina rêjîma Baas re di baweriya min de reştirîn serdeme ku li ser dîroka Sûrî re derbas bûye. Ev pêvajo hemû derfetên ku Sûriyê ber bi dewleteke moderin ve biçe, çewisandin û ket bin xizmeta partiya Baas de. Bûyerên ku hatin kirin ji serdema rêjîma Baas ve heya roja îro gelek bi êş û bişewat bûn, ji ber ku di Sûrî de netenê ereb hebûn. Raste çanda erebî çanda serdest bû, lê dibingeha xwe de a gelek netewaye. Miletê dûyemîn piştî ereba kurd in û di heman demê de Siryan, çerkes jî hene. Hilweşîna rêjîma Baas heger bi şêwazekî şoreşgerî ban, dibe ku karîban amadekarî ji bo sberoja Sûriyê yan jî destûreke nû hatiban danîn. Lê di kûrahiya xwe de dema ku em bala xwe didin, bûyerek ku ne di xeyalê tu kesî de bû, ev bûyer hêlişt ku hemû siyasetmedar jî jê bawer nekin ku Mala Esed bi hêsanî hilweşe û artêşa wî li hember HTŞ’ê li berxwe nede. HTŞ’ê jî herkes paşxaneya wê nasdike a ku ji Elqaîde hatiye, piraniya pêkhateyên wê jî kesên xerîbin yên ku hîn xemil û xeyalên xwe bi hêviya ku karibin dewletekê di bin navê misilmantiyê de avabikin. Lê wê nikaribin welatekî weke Sûrî ji hemû rengan pêk tên ku rêveberiya wê bikin an jî destûrekî jê re deynin.

# Îsa Oso: Tu kes nikare şûna Bavê Teyar dagire

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Şanoger Îsa Oso diyar kir ku Bavê Teyar bi karê xwe yê hunerî rasterast diket dilê civaka kurdî de û gelê kurd hemû bi şehadeta wî bi bandor bû û wiha got: “Wê tu kes nikaribe şûna Bavê Teyar bigire, lê em ê li ser şopa wî bimeşin.”**

Şanogerê Kurdistanî, raz û sirê kenê ku ji dil derdiket xwediyê wê Bavê Teyar bû. Ew jêdera kenê zarok, ciwan, kal, pîr û rûsipiyên kurdan ê bi dehê salan bû. Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê kîndar bûn ji vî kenî û xwestin ji holê rakin.

Di wê kêliya ku Bavê Teyar û bi dehan kesên sivîl ê Kantona Cizîrê li ser Bendava Tişrînê berxwedanî didan meşandin, dewleta Tirk êriş li ser nobekarên rûmetê kir. Li wê deverê Bavê Teyar şanoyên berxwedaniyê û rûmetê ji tevahiya gelên cîhanê pêşkêş dikir.

Di encama vê êrişê de Bavê Teyar ê bi navê Cuma Xelîl birîndar bû, piştî wê jî bi sedema birînên dijwar gihaşt asta şehadetê. Şanogerê kurd ji salên 90’î ve mijûlî şano û fîlman dibe û lîstikvanekî herî serkeftî bû. Ji wê demê heta roja şehadeta xwe bi Şoreşa Rojava re hunera şoreşgerî dikir. Derbarê huner û şehadeta wî de, hevalê wî yê şanoyê û endamê Koma Şehîd Osman, Îsa Oso ji rojnameya me re axivî.

**‘Ew rasterast diket dilê civaka kurdî’**

Îsa Oso da zanîn ku Bavê Teyar bi hunera xwe diket dilê civaka kurdî de û wiha got: “Bavê Teyar di sala 1999’î de bi koma xwe dest bi xebata şanogeriyê kir, lê berî wê di salên 90’î de wî karê şanoyê dikir. Bi riya fîlim û şanoyên xwe yên destpêkê û yên dawîn de jî nameyên taybet didan. Wî dixwest êşa miletê kurd û nexweşiyên di nav civakê de, bi rengekî komîdî çareser bike. Dema ku li fîlmên Bavê Teyar ên destpêkê tê temaşekirin komîdiya derdikeve pêş, lê ew komîdiya jî ne bêarmanc e. Nemaze di fîlmê Bavê Teyar Mêrê Di Jinan û hwd… em dibînin ku pirsgirêkek di civakê de hene û Bavê Teyar dixwaze wan bi şêwazê xwe çareser bike. Ew yekemîn kes bû ku bi riya fîlmên xwe civaka kurdî bike yek. Bi tevahiya gelê kurd Bavê Teyar nas dikir, çi li Rojava, Bakur, Başûr û an jî Rojhilatê Kurdistanê ba. Sedem jî ew bû ku Bavê Teyar dema ku dest bi xebatê kir, ew ji mijarên civakî dest pê kir. Lewma jî ew rasterast kete dilê civaka kurdî de û heskirina temaşevana hişt ku ew binavûdeng bibe.”

**‘Bavê Teyar rihê biratî û hevaltiyê li gel me ava kir’**

Oso diyar kir ku Bavê Teyar rihê hevaltî-biratiyê di nav me de ava kir û wisa domand: “Wî di şertûmercên zehmet, zexta rêjîma wê demê û astengiyan dikarîbû nameyeke xurt bide gelê kurd û pirsgirêkan çareser bike. Hêjayî gotinê ye ku Bavê Teyar di her maleke kurdî de bû û di dilê her kurdekî de bû. Dema ku fîlmekî wî derdiket, roja din zarok, ciwan û mezinan gotinên wî di kolanê de bi kar tanîn. Ev jî tê wateya ku tiştê Bavê Teyar di fîlmên xwe de gotûbêj dikirin rasterast diket dilê cemaweran de. Şanoyên wî bêhtir rengê civakî distand. Wî dikarîbû di demeke kurt de mijarekê çêbike û bixe şano, pê re jî pêşkêş bike an jî fîlmekî biafirîne. Koma me ya Ş.Osman ne mîna her komekî ku endamên wê ji gelek deveran were. Lê belê em weke bira û heval bûn, ê ku ev rihê hevaltî û biratiyê di nava me de ava kir jî, Bavê Teyar bû. Berî ku Bavê Teyar bi xwe hizir kiriba, ew diket xema hevalê xwe. Ji milê xebata şano an jî fîlmekî ve, da ku ew berhem serkeftî hatiba çêkirin wî dikarîbû gelek caran pirovayan vegerîne. Hêjayî gotinê ye jî ku ew geleke bi serkeftinê ve girêdayî bû.”

**‘Emê hertim li pey şopa Bavê Teyar bimeşin’**

Şanoger Îsa Oso anî ser ziman ku ew nahêlin Bavê Teyar were ji bîr kirn û wiha axivî: “Teyar got; em weke hevalên wî û tevahiya gelê kurd bi şehadeta Bavê Teyar bandor bûn. Dema ku konê şehadeta Şehîd Osman di sala 2013’an de li dar bû, Bavê Teyar soz da û got ji niha û bi şûn de wê navê komê li ser navê Ş.Osman be. Wî soz



da ku ew ê li ser şopa Ş.Osman xebata koma şanoyê bi hev re bidomînin. Bavê Teyar soza xwe bi cih anî. Ji niha û bi şûn de gelo em ê bikaribin vê hêzê bidin hev û cihê wî dagirin? Na, ji ber ku ew bû yê ku hêz dida me û ew bi xwe çû, êdî gelo wê kî cihê wî dagire. Eger ez bêjim jî wê zehmet be, bi rastî tu kes nikare cihê wî dagire. Wî bi şehadeta xwe û keda bi dehê salan riya hunerî bi dawî kir. Ji ber keda ku Bavê Teyar dabû, em ê weke Koma Şehîd Osman bi hemû derfeta xwe kar bikin. Herwiha em ê li ser şopa Bavê Teyar û şehîdên bêriya wî bimeşin. Em hêviya Bavê Teyar û navê wî û şehîdên xwe li erdê nahêlin.”

# ‘Rojava axa me ye, warê berxwedan û şehîdan e’

Rojnamevan Bîlal Gûldem da zanîn ku gelê Bakur, ji Silopiya heta Nisêbînê, ji Nisêbîn heta Hatayê xwedî li gelê Rojava, berxwedan û destkeftiyên gelê kurd û hemû pêkhateyan derket. Her wiha teqez kir ku pêwîste sazî û dezgehên navneteweyî bi awayek baldar û seferber li dijî kuştin û girtina rojnamevanên Kurd rabin.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Êrişên dagirkeriya Tirkiyê li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bê navber têne domandin. Li hember van êrişan gelê Bakurê Kurdistanê bi yek helwestê dest bi çalakî û xwepêşandanan li seranserê Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê kirin. Têkildarî van geşedanan Rojnamevan Bîlal Gûldem bersiva pirsên rojnameya me dan.



**1. Ji destpêka aloziya Sûriyeyê ve her tim gelê Bakurê Kurdistanê li rex gelê Rojavayê Kurdistanê di heman çeperê de sekiniye, girîngiya temamkirina vê berxwedanê hûn çawa dinirxînin?**

Ji roja roj ve gelê Bakurê Kurdistanê ji nêz ve geşedanên li Rojavayê Kurdistanê û qewimandinên li Sûriyeyê dişopîne. Siyaset, sazî û gelê Bakurê Kurdistanê ji roja roj ve xwe wek hevkarê têkoşîn û berxwedana gelê Rojavayê Kurdistanê dibîne. Hem bi Şoreşa Rojava şanaz bû û hem jî her daîm piştevanê vê şoreşê ye. Ji ber ku gelê Bakurê Kurdistanê ti cûdahîyê naxe navbera xwe û Rojava. Çimkî berê sînorê di navbera her du aliyan de nebûn, berê digotin serxet û binxet. Xelkê serxetê û binxetê nasî hev û xizmên hev in. Her çiqas di van salên dawî de bi dîwarên ser sînor têkiliya wan a fizîkî hatibe qutkirin jî. Em ji roja destpêka Şoreşê ve lê binêrin heta berxwedana Kobanê û ji rizgarkirina Kobanê û deverên din bigire heta roja me ya îro gelê Bakurê Kurdistanê her tim li kêleka daxwaz û berxwedana Rojava cih girt. Bi hezaran keç û xortên ji Bakur bi can û xwîna xwe erda Rojava parast. Lewma gelê Bakur berxwedan û têkoşîna li wir wek a xwe dibîne. Gelê Bakur dibêje ku keç û xortên me bi xwîna canê xwe destkeftiyên Rojava bi dest xistin. Lewma dibêjin ku ew neçar in xwedî li berxwedan û şoreşa Rojava derkevin. Xelkê Bakur, her pêşketinek li Rojava wek pêşketina xwe dibîne. Mînaka şênber a ku gelê Bakur di çeperên berxwedana Rojava de cih girt jî berxwedana Kobanê û cihên din e. Dema berxwedana Kobanê me li Bakur dît ku sînorên-tuximên çêkirî bê wate ne û bi deh hezaran xelkê vir sînor tunekirin û hatin li Rojava ketin nava refên şoreşê û bedelên giranbuha dan. Nexwestin ku Rojava, Kobanê û deverên din bikevin ji bin serweriya komên çete yên bê armanc. Girîngiya temamkirina berxwedanê jî sekn û helwesta li dijî DAIŞê û çeteyên din e. Îro jî sekn û berxwedana gelê Bakur wek roja destpêkê berdewam dike.

**2. Bi qewimandinên pêvajoya dawî re çalakiyên piştgiriyê yên li Bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin raberkirin. Asta van çalakiyan, li ku derê digire di nav xwe de û tevlîbûna gel çawa bûn?**

Bi destpêkirina vê qonaxa dawî ya li Rojava û li Sûriyeyê carek din gelê Bakur zend û bendên xwe bada û tevî hemû zextên li Bakur jî xwedî li berxwedana Rojava derket. Helbet em dizanin piştî pêşketinên li Helebê û paşê hilweşandina rejîma Esed ango Baasê û êrişên li ser deverên Minbicê, Bendava Tişrînê û Kobanê, gelê Bakur ji Silopiya heta Nisêbînê û ji Nisêbînê heta Hatayê xwedî li gelê Rojava û berxwedan û destkeftiyên gelê Kurd û hemû pêkhateyan derket. Nobet ango çalakiya parastin û xwedîderketina li ser sînorê Nisêbîn û Qamişlo hat destpêkirin û paşê li ser sînorê Pirsûsê û Kobanê berdewam kir, nîşaneya vê yekê bû gelê Bakur carek din amade ye ji zarokan bigire heta kal û pîran wê xwedî li statu û destkeftiyên Rojava derdikeve. Li Nisêbîn û Pirsûsê bi rojan nobeta xwedîderketina Rojava hat lidarxistin û peyamên ji van her du navendan dihat dayîn pir eşkere û zelal bû; ‘Rojava em in û Rojava axa me ye û warê bedeldayina zarokên me ye’. Li seranserî Bakur û bajarên Tirkiyeyê çalakiyên xwedîderketina li Rojava her berdewam kir û hê jî didomin. Di her peyamek û daxuyaniyek hat dayin de hat xwestin ku statuya Rojava bê nasîn û rê li ber êrişên komên çekdar û Tirkiyeyê bê girtin. Ji siyasetmedaran bigire heta welatiyan daxwaz kir ku di şexsê Rojava de êdî dema naskirina statuya gelê Kurd û pêkhateyên din hatiye. Lewma jî ji partiyên siyasî yên Kurdî bigire heta rêxistinên sivîl, rêxistinên jinan, ji her beşên civakê di nav van çalakiyên xwedîderketina Rojava de cih girtin û gotin ew bi her awayî piştevanên gelên Rojava ne. Çalakiyên nobeta xwedîderketina Rojava li ser sînor bi dawî bûn û ev çalakî berbelavî hemû Bakur û bajarên Tirkiyeyê bûn. Gelê Bakur jî bi qasî gelên Rojava bi hilweşandina rejîma Baas kêfxweş bû û hat xwestin ku êdî dor dora naskirina îradeya gelên Rojava ye. Her wiha gelê Bakur piştî pêvajoya dawî ya li Sûriyeyê û Rojavayê Kurdistanê qewimî ji vir bang li partiyên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê kirin ku ji bo parastina statu û destkeftiyan yekrêziya xwe çêkin û ev yekitî û tifaq wê bandorê li Bakur jî bike.

**3 . Li ser bingeha şerê gelê şoreşgerî divê li ser asta Kurdistanê kar û xebatên çawa bên meşandin?**

Pêngav û bizavên li Rojava di vê dema nû de hat destpêkirin, ji aliyê gelê Bakurê Kurdistanê ve jî dilgermî hat pêşwazîkirin. Helbet her tim şoreş û berxwedana gelê Bakur jî ji bo her sê aliyên din ê Kurdistanê bûye çavkanî û moralê herî xûrt. Gelê Bakur di çarçoveya pêngava li Rojava hatiye destpêkirin dibêje, pêwîste di her warî de nirxên Kurdistanê ji parastina wan bigire heta ziman û çanda wan bên parastin. Gelê Bakur diyar dike ku êdî tu sebr û tehamula Kurdan ji windakirina sedsalek din re nîn e, ji ber vê yekê statuya li çar aliyên Kurdistanê û parastina her cure nirxên Kurdistanî girîng û dîrokî dibîne. Her wiha sazî û dezgehên siyasî û sivîl û gelê Bakur pêwîstî bi ruhê yekgirtî dibîne û radigîhînin ku dawî li siyaseta xiyanet û nokeriyê bê anîn. Hewceyî bi yekrêziya Kurdistanê heye.

**4 .Di sedsala 21’emîn de çima rojnamevan tên armanc kirin? Rûxmî ku di asta navneteweyî de xwedî mafin jî û hesap nayê pirsîn?**

Beriya her tiştî rojnamevanên ango rojnamevaniya li ser xeta Çapemeniya Azad a Kurdî alîgirên aştiyê û parastina nirxên Kurdistanê ne. Mirov dikare bêje ku rojnamevaniya Çapemeniya Azad rojnamevaniya aştiyê, azadiyê, demokrasiyê, edaletê û wekheviyê dikin. Ji ber ku rojnamevanên Kurd her tim bûne hedefa şer û mexdûrên şer, her daîm rojnamevaniya aştiyane kirin e. Ji bo hemû bawerî, netew û çandan bi hurmetî weşan kirin e. Rojnamevanên Kurd li çar aliyên Kurdistanê her dem sûcên şer belge kirin e, piştrast kirin e û ji raya giştî ya cîhanê re eşkere kirin e. Lewma rojnamevanên Kurd dibin armanca êrişan û tên kuştin. Çimkî hêzên serdest naxwazin ku êriş û sûcên wan şer ên li ser Kurdistanê werin eşkerekirin, ji ber vê yekê rojnamevanan dikin hedefa êrişan. Em bala xwe bidinê beriya her pêvajo û qonaxên girîng rojnamevanên Kurd li çar aliyên Kurdistanê dibin armanca êrişan. Di serî de Tirkiye û hêzên din naxwazin ku rastiya deng û rengê Kurdistanê bi cîhanê re were parvekirin. Em mînaka vê yekê dikarin di şexsê kuştina rojnamevan Nazim Daştan û Cîhan Bîlgîn de bidin nîşandan. Çimkî wan li Rojava sûcên şer ên komên çekdar ku bi destên hêzên serdest êrişî Rojava dikin eşkere kir. Di oxira vê yekê de jî hatin kuştin. Bi zanebûn û armancgirtin hatin bombebarankirin. Nazim Daştan ji berxwedana Kobanê bigire di her pêngavên li Rojava de li çeperên herî pêş ên berxwedana Kurdan û pêkhateyên din de bi kamera, wênegir û pênûsa xwe rojnamevaniyê kir û bû dengê Kurd û hemû pêkhateyan. Lewma her du cangoriyên me jî hatin şehîd xistin.

Divê meriv pirs bike gelo rojnamevanî tenê ji bo Kurdan sûc e? Çima hemû rojnamevanên li cîhanê dikarin rojnamevaniya “şer” bikin û li qadên şer karên xwe bikin lê çima rojnamevanên Kurd nikarin bikin. Rojnamevanên Kurd kar û xebatên wan tên ‘terorîzekirin’. Helbet em li tu devera cîhanê naxwazin rojnamevan bibin armanca êrişan û bên kuştin. Gelo rojnamevanên li Filistînê, Xezeyê û li deverek din ê cîhanê dema tên kuştin, rojnamevan in lê gelo yên Kurd ne rojnamevan in? Divê ev pirs ji Tirkiyeyê bên kirin. Sed heyf û mixabin sazî û dezgehên navneteweyî ku parastina rojnamevanan dikin jî mijara binpêkirina mafên rojnamevanên Kurd de bêdeng in.

Tevî ku rojnamevan di qanûn û peymanên navneteweyî de xwedî maf û heq in jî lê dîsa hedef tên girtin û bi awayekî hovane tên kuştin. Lê bi taybetî rojnamevanên Kurd dibin armanca êrişan. Rojnamevanên Kurd dema tên kuştin wek rojnamevan nayên dîtin. Çima? Ji ber ku xwedî nasnameya Kurd in û dibin berdevk û nûnerê heqîqetê. Pêwîste sazî û dezgehên navneteweyî bi awayek baldar û seferberî li dijî kuştin û girtina rojnamevanên Kurd rabin û xwedî li hemû mafên wan derkevin. Pêwîste sazî û dezgehên navneteweyî ji bo Nazim Daştan, Cîhan Bîlgîn, Gulistan Tara, Hêro Bahadîn... dinyayê bihejandina lê mixabin qels û bêdeng man. Nemaze rayedarên Tirkiyeyê ji bo rojnamevanên li Filistînê hatin kuştin, rondikan dibarîne û ji bo kuştina rojnamevanên Kurd jî kêfxweşiya xwe tîne ziman. Ka gelo ev durûtî û nakokî wê çawa bê qebûlkirin.

Lê helbet bi kuştin û girtinan wê ne Tirkiye û ne jî hêzek din dikaribe deng û têkoşîna rojnamevanên Kurd qut bike. Çimkî ev nêzî 35 sal in çi li Bakur çi jî li aliyên din ên Kurdistanê di serî de Tirkiye û dewletek din nikaribûye ku deng û azweriya rojnamevanên Kurd û dostên wan têk bibe. Her ku em hatin girtin û kuştin, em hin bêtir zêde bûn û belavî cîhanê bûn. Her ku ji me girtin û kuştin, bi dehan û bi sedan şagirt li pey wan rabûn.



# Em ji mirinê mezintir in

Bendava Tişrînê ku îro weke bendava şehîdan û berxwedanê tê naskirin, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ji 8’ê Berfanbara 2024’an ve, bi awayekî hovane êrişî Bendava Tişrîn û pira Qeraqozaqê dikin. Di wan êrişan de gelek berdêlên giranbuha hatin dayîn. Şervan û gelê ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijîn bi felsefeya “Em ji mirinê mezintir in” bi têkoşîna xwe li ser rûpelên zêrîn dîrok nivîsandin.

**Tekoşîn Amara /Qamişlo**

Gelê Bakur û Rojhlatê Sûriyê geleke ku bi salane li hemberê Çeteyên DAIŞ’ê û dewleta tirk a dagirker têkoşînê dimeşîne. Şoreşa Rojavayê kurdistanê bi hevgirtina gel û şervanan ku heta roja îro hatiye pêşxistin û bi şoreşa Rojavayê kurdistanê re gelê Rojava gelek destkeftiyên binirx bi dest xist, dewleta tirk û çeteyên wê ji bo ku wan destkeftiyan ji holê rake bi salane erîşên xwe didomîne. Dewleta tirk carekedin bi awayek êşkere li ber çavên hemû cîhanê êrîşên sivîlan dike û komkujiyan pêk tîne. Çawa ku li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê sivîl qetilkirin bê ku bêje ev jine, zaroke an jî extiyare bi tang, top û firokên xwe kumkujî li ser gel pêk anî, îro jî heman pratik tê jiyan kirin. Rûxmê ku cîhan tev û rêxistinên mafê mirovan vê dibînin jî, lê li hemberê vê yekê bê dengin.

**Gel bi duruşma Berxwedan Jiyane li hemberê astengiyan li ber xwe dide**

Gelê ku ji bo parastina av û axa xwe bi coşeke mezin berê xwe dide bendava tişrînê bi duruşma “ BERXWEDAN JIYAN E” bi rihekî berpirsiyar rûxmê hemû astengiyan jî berê xwe dide bendavê. Dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê bi çuyîna gel re êrîşên xwe dijwartir dike. Rûxmê ku birîndar û şehît rojane di van êrişan de çêdibin, lê gel bi israre ku axa xwe û çavkaniyên jiyana xwe biparêze û gav paşda navêje. Gelê ku li bendavê nobet digre gotin ku ger bendav hilweşe wê bandorê li ser tevahî gelê Bakur û Rojhilatê Suriyê metirsiyeke mezin ava bike. Li gorî zagonên cîhanê hedef girtina bendavan sûce, lê dewleta tirk ew 43 rojin bê navber êrîşê bendavê dike, ger îro ew bendav hilweşe bi dehan cîhên Nîştecîhbûnê di bin avê de wê bimînin.



**Gelê Bakur û rojhilatê suriyê bi vîneke xurt berê xwe didin bendava Tişrînê**

Dewleta tirk a dagirker ji 8’ê Kanûn a 2024’an de li Bendava Tişrînê dest bi êrîşan kiriye û her roj di çapemeniya xwe de digot ku me bendava tişrînê dagirkiriye, bi berxwedanî û têkoşîna şervanan derewên dewleta tirk derketin holê. Di bendava Tişrîn û pira karakozaqê de kêliyên dîrokî têne jiyan kirin û şervanên QSD, YPG û YPJ’ê bi berxwedaniya xwe careke din kêlî bi kêlî rastiya dewleta tirk û çeteyên wê nîşanê cîhanê dan. Dewleta tirk a dagirker îro dixwaze komkujiyan pêk bîne û mêtingeriya xwe berfireh bike. Dewleta tirk û koma wê ya paramîlîter SMO, zêdetirî meheke êrişên dijwar dibin ser Bendava Tişrînê. Xelkên Kurd, Ereb, Suryan, Asur û Ermen jî li dijî êrişan berê xwe dan Bendava Tişrînê. Ji 8’ê Çileyê, li ser banga Rêveberiya xweser şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo parastina Bendava Tişrînê û bi armanca nîşandana dijberiya xwe ya li hemberî van êrişan ji gelek bajaran ber bi herêmê ve çûn. Tevî hewayê sar jî gel nobeta xwe didomîne. Dewleta Tirk rojane li ser gel komkujiyan pêktîne, lê gel her di têkoşîna xwe de bi israre. Di encamê de 140 sivîl û di navde jî 4 rojnamevan birîndar bûn û 22 sivîl jî şehîd ketin.

**Bendava berxwedanê rûmeta me ye**

Çalakvanên ku 19 rojin li bendavê bê dorveger nobetê digrin, mesac û bersivên dane dagirkeriya tirk û cîhanê û gotin ku emê heta hinaseya xwe ya dawiyê dev ji bendavê bernedin û heta dawiyê li kêleka şervanên xwe bin. Têkoşîn û berxwedana şervanên azadiyê berxwedaneke dîrokî ye û ji bona me jî cihê hêz û coşê ye. Dewleta tirk a qirker û dagirker 100 salin ku tehamula navê kurdan nake û hebûna wan ji bo xwe xeter dibîne, ji ber wê jî bi qirkirinê dixwaze hebûna xwe rewa bike. Gel got ku “emê ti carî li hemberê êrîşan dev ji berxwedana xwe bernedin. Çavê me li axa kesî nîne û ne jî em êrîşê axa kesê dikin, ev ax ya me ye û emê bi berxwedaniya xwe bi awayekê azad bijîn.”



**Dewleta tirk bi êrîşên xwe dixwaze vîna gel bişkîne**

Ji 8’ê Kanûnê ve êrîşên hewayî û bejahî yên dewleta Tirk û komên wê yên paramîlîter li ser bendava Tişrîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tîne. Berxwedana li dijî êrîşan 43 roj in bê navber didome. Di 8’ê Çileyê de li ser banga Rêveberiya Xweser bi hezaran şêniyên bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo av û axa xwe biparêzin berê xwe dan bendava Tişrînê. Li gel êrîşên li ser bendavê, gelê ku berê xwe da bendavê gelek caran rastî êrîşan hatin. Rûxmê hemû êrîşan jî gel ji doza xwe venegeriya û bi israr xwe gihand bendavê. Her roj bendav ji aliyê balafirên şer ve tê bombekirin., lê tevî vê yekê jî bi sedan kes ji bo piştgiriyê bidin çalakiya nobedê berê xwe didin bendavê. Dewleta Tirk bi van êrîşan dixwaze vîn û berxwedana gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bişikîne. Rûxmî hemû êrîşên dagirkeriyê dewleta Tirk jî çalakiya gel a ku ji 8’ê Çileyê ve destpê kiriye heta niha bê navber didome. Gelê ku diçe bendavê jî bi gotinên Em ji mirinê mezintirin û heta ku yek ji me jî bimîne emê axa xwe ji dagirkeriyê re nehêlin û heta dawiyê têkoşîna xwe bidomînin.

**Bi rihê şoreşa 19’ê Tîrmehê em ê, bendavê biparêzin**

Piştî banga rêveberiya xweser a demokratîk bi hezaran jin, ciwan û zarok û kesên emir mezin ji 7 heta 70 salî berê xwe dan bendava tişrînê. Welatiyên ku derbasê bendavê bûne rûxmê hemû êrîşan jî bi îradeyek xort mesajên giring da dewleta tirk a dagirker. Em yek deqe û yek kêliyekê jî ranawestin û em li hemberî dagirkeriyê serî natewînin. Em careke din dubare dikin ku em dev ji bendavê bernadin û piştevaniya QSD’ê bikin û berxwedana xwe bidomînin. Em ê li vir bin û bi rihê şoreşa 19’ê Tîrmehê li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin. Em ê bi ser kevin û em ê Sûriyeke azad, demokratîk û federal bi hemû pêkhatiyên xwe ava bikin. Dayîka bi navê Edlê rûxmê ku di êrîşên hewayî yên dewleta tirk de birîndar jî dibe bi israr û bi vîneke xurt bê ku bi êşa birîna xwe bihise coş da çalakvanan û bang li dewleta tirk dikir û digot “ Em ji mirinê mezintirin” tû nikarî bi tang û topên xwe çavên me bitirsîne.

**Bi rihê şerê gelê şoreşgerî parastina av û axa xwe dikin**

gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rihê gelê şoreşgerî li bendava tişrînê bi parastina nirxên şoreşê, av û axa xwe dike. Axa ku bi xûna hezaran şehîda hatiye parastin dewleta tirk a dagirker dixwaze ku carek din dagir bike. Gelê ku li ser bendava Tişrînê bi biryardarî nobet digre, bi coşeke mezin ji dewleta tirk re gotin ku heta dilopek xûn di canê me de hebe emê dev ji axa xwe bernedin, ger pêwîst bike emê bi şervanên xwe re çeperên şer bigrin. Tang û topên dijmin nikare îradeya me bişkîne, em gelekî ku bi ramanê Netewa Demokratîk mezin bûne û emê bi şerê gelê şoreşgerî li ber xwe bidin. Dewleta tirk bi konseptekî taybet û pilankirî êrîşên xwe li heremê pêk tîne, bi armanca dest avêtina destkeftiyên gel û şoreşa rojava ev yek tên kirin. Bi van êrîşên qirêj dixwaze ku gel bitirsîne da ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê terka cih û warê xwe bike. Her roj sivîl tên hedefgirtin û bi vî awayê şerekê qirêj û dermirovî û ne yasayî tê meşandin.

**Bi hildana tiliyên serkeftinê dijmin har dibe**

Birîndarên bendava Berxwedanê û Şehîdan bi hildana tiliyên serkeftinê tirsekê mezin dikin dile dijmin û ew çi bike jî nikare yekîtiya kurdan ji holê rake. Me di gelek dîmenan de jî dît ku gelek kesên di êrîşa dewleta tirk de birîndar bûn û rûxmê êş û azara birînin wan jî tiliyên serkeftinê radikirin û digotin ku em ê heta dawiyê têkoşîn bikin û tu caran gav paş de navêjin. Bila Erdoxan nefikire ku wê me tune bike, bila baş bizanibe ku em çiqas ser hişkin em gelekî wêrekin ku me çawa 2014’an de kefenê mirinê çirand emê îro jî kefen biçirînin. Heta ku em bigîjin serkeftinê emê ax, av û bendava ku bi xwîna şehîdan hat avdan biparêzin.

# ‘Dewleta Tirk girtin û qetilkirina rojnamevanan rewa dike’

Rojnamevan Naz Roza Ozek diyar kir ku Ragihandina Azad di eşkerekirin û deşîfrekirina rastiya şer û siyaseta qirker de roleke sereke lîst û dilîze. Herwiha dewleta dagirker û rayedarên wê ewqasî aciz û bêçare dimînin, lewma jî rojnamegeran dikin hedef.

**Amara Baran/Qamişlo**

Dewleta tirk a dagirker ji bo ku rastiya ji holê rake û dengê çapemeniya azad tune bike li Bakûrê kurdistanê bi girtinê li rojavayê kurdistanê jî bi qetilkirin û gef xwarinê rojnamevanan dike hedef. Herwiha bi qetilkirina rojnamevan Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan û bi gef xwarin û binçavkirina rojnamevanan carekedin ispatkir ku dev jî sûcên xwe yên li ser medya û ragihandinê bernedaye. Nûçegîhana Ajansa Welat Naz Roza Ozek di vê çarçoveyê de ji rojnameya me re axivî.

**Hedefgirtina rojnamevanan sûcê herê giran yên şere**

Naz Roza anî ziman ku Ragihandina azad di eşkerekirin û deşîfrekirina rastiya şer û siyaseta qirker de rolekî sereke lîst û dileyîze ku dewleta dagirker û rayedarên wê ewqasî acîz û bêçare dimînin ku rojnamegeran dikin hedef û wiha domand” Heya niha gelek rojnamegerên ragihandina azad hatine hedef girtin û bi giranî bi riya siwîkastan ev yek hatiye kirin. Herî dawî jî rojnameger Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan rastî êrîşekî hovane ya dewleta Tirk a dagirker hatin û şehîd bûn. Li çar aliyê cîhanê hedef girtina rojnamegeran wek suçekî herî giran yê şer tê hesibandin û wek gavên dermirovî tê dîtin. Dewleta herî zêde rûreş û xwedî lîsteya dirêj ya suçên şer e, îro dewleta Tirk û hevkarên wê ne.

**‘Bi girtin û qirkirinê aşitî pêk nay ê’**

Naz Roza got em wek rojnamevan em di bin şert û mercên herî giran û zextên herî zehmet de kar û xebatê dikin û her roj rojnamevan têne hedefgirtin. Li gor daxûyaniyên Partiya DEM’ê xûya ye hemû hevdîtin erênî derbas bûn e. Lê pêla girtin û desteserkirinê ku hatiye destpêkirin dide xuyakirin ku dewlet dev ji siyaseta qirkirinê bernade. Her roj êrîş li dijî Rojava pêk tên, ger behsa aşitiyê tê kirin divê dewleta tirk dev ji siyaseta qirkirinê berde.”

**`Dewleta tirk qetilkirina rojnamevanan ji xwe re rawa dibîne’**

Naz Roza diyarkir ku; behsa pêvajoyê dikin lê girtîgehên Tirkiyeyê jî dijî kurdin. Tecawizkar, tiryakkêş û dizî li tirkiyê li derve ne, lê kesên xwende, ronakbîr, rojnamevan di girtîgehê de ne. Dewleta tirk naxwaze cîhan rastiya wê bibîne û siyaseta wê ya gemar û qirêj nasbike, ji ber vê yekê jî Nazim û Cihan qetilkirin. Nazim û Cihan rûyê rast yê dagirkeriya tirk eşkere kirin, ji bona wê yekê ew kirin hedef. Bi nûçe û îradeya ku nîşandan bûn moral û bûn mînaka cesaretê. Li gel



êşa me ewqas giran bû cenazeyên wan bi rojan hate sekinandin ji bo li bakûr were definkirin, lê bi malbatên dil bi êş re weke ku henekê xwe bikin bi rojan li ser rêyan bi hêviyeke cenazeyên zarokên wan dê were dayîn hate leyîstin.

**‘Çi dibe bila bibe emê li ser şopa heqîqetê bimeşin’**

Naz Roza wiha axaftina xwe domand” Bi salan e şereke qirêj tê meşandin û di vê şerê ku bi destê çeteyên paramîlîter destpêkirine de tê xwestin ku kurdan biqedînin li ser rûyê dinyayê. Dixwazin kurdan tine bikin û dema dengekê ji bo azadiyê dibhîzin dixwazin wî dengî qut bikin. Em rojnamevan jî, çi dibe bila bibe emê li ser rêya heqîqetê tevbigerin. Rastiya şêra ku niha li bendava Tişrîn û Karakozaxê tê jiyîn bi saya çapemeniya azad, hemû cîhanê dît ku berxwedanî di kîjan astê de tê meşandin û gotinên çapemeniya dewleta tirk a şerê taybet vala derketin.

**‘bêdengiya saziyên navnetewî hevkariya wan ya bi dewleta tirk re nîşan dide’**

Naz Roza di dawiyê de balkişand ser bêdengiya saziyên navnetewî li hemberê girtin û qetilkirina rojnamevanan û got” êrîşên li ser çapemeniya azad êrîşên li ser rastiyê ne. Hêza çapemeniya azad bi heqîqetê çavên wan ditirsîne, ji ber ku qirêjiyên wan radixe ber çavê cîhanê dibin hedef. Divê ji her milî ve xebatkarên çapemeniya azad bên parastin û mafê wan yên nûçegîhaniyê neyê binpêkirin. Ruxmê ku li ber çavên saziyên navnetewî rojnamevan tên girtin û qetilkirin, lê bi tu awayî bertek li hemberê girtin û qetilkirina rojnamevanan nîşan nedan û bi tu awayê nerazîbûnên xwe neanîne ziman. Bêdengbûna wan tê wateya piştgirîdayina hêzên pramîlîter e, û hemû jî bi yek hedef û armancê êrîşên xwe didomînin. Pêwîste gelê kurd bi yekbûna xwe li pêşiya êrîşên li ser rojnamevanan bigre û nehêlin dengê rastiyê qut bibe. Di dawiyê de emê weke çapemeniya azad li hemberê siyaseta qirkirinê ya ku dagirkeriya tirk li ser gelê me dide meşandin her tim di nava têkoşînê de bin û ev erkekê me yê dîrokî ye.”

# ‘Armanca me pêkanîna Yekrêziya Kurdî ye’

**Dîlan Mulhim/ Qamişlo**

**Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ ê Perwîn Yûsiv diyar kir ku ew hemû hewldanên xwe dikin ku yekrêziya kurdî pêk were û wiha got: “Di dema niha de em haziriya kongirekî navnetewî dikin, ev kongir wê ji bo çarenûsa gelê kurd bê li darxistin.”**

Piştî rûxandina rêjîma Bass û hatina hikumeta Sûrî ya demkî gelek guhertin li tevahiya Sûriyê çêbûn û tevahiya gelên Sûriyê di pêvajoyeke girîng de derbas dibin. Wekî gelê kurd jî ya herî girîng ji bo bidestxistina mafên xwe di Sûriya nû de, pêkanîna yekrêziyê ye. Di derbarê hewildanên pêkanîna yekrêziya kurdî de hevseroka Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê Perwîn Yûsiv ji Rojnameya me re axivî.

**‘Gelê Kurd birêxistinkirî ye’**

Perwîn Yûsif da zanîn ku ew hemû hewldanên xwe dikin ku aliyên kurdî bigihînên hev û wiha got: “Me gelek kar û xebat ji bo yekêtiya kurdî daye meşandin û gelek rêbaz bikaranîne, ew rêbaz jî ku em aliyên kurdî nêzî hev bikin û dest bi diyalokan bikin. Herwiha bi ketina Rêjîma Bass û hatine hikumeta demkî ku beşekî mezin ji axa Sûriyê kiriye bin kontirola xwe ku her kes matmayî ma û ka wê rewşa Sûriyê ber bi kû ve biçê. Ji ber vê yekê ji 8’ê Berfanbara 2024’an ve rojev bi giştî hate guhertin û ka wê çarenûsa gelê Kurd di Sûrîya nû de çibê, ev pirs tê kirin. Ji ber vê yekê divê demê de em yekêtiya kurdî ava bikin û gelê kurd birêxistinkiriye û xwedî partî û saziyî ye. Di nava vê aloziya Sûriyê de jî gelê kurd rêveberiya xwe daye avakirin. Herwiha aliyên kurdî bi du aliyan ve hatiye girêdan, aliyek sîstem û hêza xwe bi xwe ava dikê û li ser erdê kar û xebatên xwe li gorî pêdiviyên gel dide meşandin, ev alî jî yê Rêveberiya Xweser e.”

**‘Pêwîste di navbera aliyên kurdî de rûpeleke nû bê vekirin’**

Perwîn Yûsiv eşker kir ku piştî rûxandina rêjîma Bass dem hatiye ku yekîtiya kurdî were avakirin û wiha domand: “Em di pêvajoyekê de ne ku pêwîste em îro berî sibe yekêtiya xwe avabikin. Divê gelê kurd bi hemû hêza û partiyên xwe dest bi diyalokê bikin, ji ber ku rewşa Sûriyê hatiye guhertin û pêwîste em xwe bidin guhertin û rûpeleke nû vekin. Di vê rewşa niha ya Sûriyê de, divê ku em destek bin, ji bo ku em karbin baweriya bi hêviyên gelê kurd bînin, tê xwestin ku em yekêtiya xwe çêkin. Herwiha çarenûsa gelê Sûriyê bi giştî tê guhertin û çarenûsa gelê kurd di Sûriya nû de çawa bê û pêwîste di destûra Sûriyê ya nû de mafê gelê kurd hebe. Divê em yek helwestbin ji bo çarenûsa gelê kurd. Ji ber vê yekê gelek instantîf dest pê kirin û di sala 2018’ an rêveberê giştî yê Sûriya Demokrat Mezlûm Ebdî insînatîveke destpêkirbû ji bo ENKS’ê û PYNK bigihînê hev. Di heman demê de israr hebû ku yekîtî çêbibê lê ji sala 2020 heta 2024 de ev diyalok hatibû rawestandin. Lê niha rewşa herêmê hatiye guhertin û pêwîste diyalokên ku hatine rawestandin bi rûpeleke nû bên destpêkirin.”

**‘Divê ENKS’ ê li gorî doza kurdî tevbigere’**

Hevseroka Partiya Yekêtiya Demokrat PYD’ ê Perwîn Yûsiv axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji bo ku em rûpeleke nû vekin me bangewaziya yekitiyê kir û gelek daxuyanî dan, herwiha bi riya van



insitantîfan me xwest ji ENKS ’ê re bêjin û em dixwazin hev re li ser masyekê rûnin û bi riya dîyalokê pirsgirêkên xwe çareserbikin. Lê mixabin heta roja îro ENKS’ê nehatiye li ser masê û çiqasî me civînên berferih çêkirin hazir nabe û astengiyên li pêşiya vê yekêtiyê derdixe. Ji xwe xuyaye ku îradeya ENKS ê ’ ne di destê wê de ye û di destê dijimên kurdan de ye ku nahêlin gelê kurd bibin yek. Pêwîste ENKS’ê ji hişmendiya dewleta Tirk xwe derxin û em bangewaziyê dikin ku ENKS ê vegerê li ser refa kurdî û di nava gelê xwe de siyasetê bikin, ji bo berjwendiya gelê xwe. Niha me haziriya kongirekî navnetewî dikin û piştî serê salê ye û me vexwenidname ji ENKS’ ê gelek partiyê din bixwazin û di vê kongirê de wê wesîqe were derxistin û nêrînên me bibin yek ku ka wê pêşeroja gelê kurd di Sûriya nû de çibê.”



## Ruhê Berxwedana Tişrînê Qonaxek Nû ye!

**Ahmet Aktaş**

Dema ku min bala xwe da berxwedêrên vê dawiyê û bi taybetî yên Tişrînê; ruh, hilwest, coş û naveroka gotinên şervan û bi taybetî yên gel, pir bala min kişand
Hema yekser gotin û hilwestên Rêber APO yên hinek demên ku çarenûsa gel di rojevê de bû, hatin bîra min. Yek jê dema Şehadeta Hakî Karer bû; di 1977an de em li Enqereyê ji semînerek KURTULUŞ’ê derketin û meşiyan. Rêber APO bi xemgînî belê bi dûrbîniyek kûr, van gotinên dîrokî rêz kir: Bi şehadeta Heqî re, peyama dewletê ev e; me bitirsîne û em dev ji şoreşgeriyê berdin, îca du rê li pêş me ne; devjêberdana şoreşê yan jî bi tolhildana şehîdê xwe, mezinkirina şoreşê! Helbet li ser rêya duduyan meşiya û rêxistina xwe mezintir kir; û di 1978an de Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ava kir.
Ya duyem jî çalakî û şehadeta Mazlûm Dogan bû; di Newroza 1982’an de em li Rojhilata Navîn bûn. Rêber APO li ser vê çalakiyê jî bi xemgîniya xwe re, bi bingehîn biryardariya xwe ya ji pola nîşan da û got: Peyama hevalê Mezlûm, ji bo me ferman e, jixwe bi vê çalakiya xwe êdî ne bi tenê tirs şikand, belê êdî mirin jî li ber çavê me biçûk kir û divê êdî bi amadekariyek gelek mezintir em, vegera welat pêk bînin, encex wisa tola hevalên zîndanê hilînin û em karibin layiqî wan bin! Tê zanîn, çalakiyên zindana Amedê li pey hev dewam kirin; çalakiya Ferhat Kurtay û hevalên xwe, çalakiya nexwarinê heta mirinê ya Xeyrî, Kemal, Akîf û Alî!
Li ser ruh û peyamên van çalakiyan Rêbar APO, hemû hevalên xwe yên derketibûn Rojhilata Navîn-Lubnan, li ser wê biryardariya xwe perwerde kirin û bi ruhekî berxwedêr, serhildêr û tolhildêr vegerand welat-Kurdistanê!
Kurteçîroka dîroka vê berxwedana dîrokî ya bi dirûşma berxwedan jıyan e dest pê kir û îro gihiştiye Tişrînê, mirov dikare wisa nîşan bide: Li ser fermana wan pêşengên zîndanê, Rêbar APO perwerda hevalên xwe temam kir û bi rêxistinên nûjen re derbasî welat kir. Bi navê rêxistinên siyasî û leşkerî; ERNK, HRK, ARGK û hwd pêşî bi Komên Çekdarên Propagenda pêngavên mîna 15’ê Tebaxê hat avêtin û paşê pêvajoya şoreşa gelîrî ya demdirêj dest pê kir, dewama wê gihişt Şoreşa Rojava ku ev bû 12 sal in dewam dike!
Îca ew ruh û helwestên şoreşgerî, yên yek bi yek di wan qonaxên dîrokî re derbas bûn ku îroj gihiştine Tişrînê, di kesayetên Bavê Teyar, Menice Heyder û hevalên wan de, helwesta bi giştî ya şervan û gelên herêmê yên Rojhilat û Bakurê Sûriyê, ew gotinên Rêber APO yên şikandina tirsê û biçûkirina mirinê yên di wan qonaxên dîrokî de hatibûn gotin, anîn bîra min.
Lewma mirov dikare bêje di şoreşa me de ev qonaxeke nû nîşan dide, ji ber ku êdî li kêleka şervanan piraniya gel jî, tirs şikandiye û dikare bi wêrekî berê xwe bide mirinê. Ev şoreşa xwedî pêşeng û gelekî wisa serhildêr û berxwedêr e ku ti caran naşike, belê neyarên wan dişkin û pergala wan hildiweşe.



# 26’ê Çileya 2015’an roja rizgarkirina cîhanê ji hovîtî û tarîtiyê ye

Piştî 5 mehan ji berxwedaniya li dijî hovîtiya çeteyên DAIŞ’ê, di kêliya ku hat gotin; “Va ye Kobanê dikeve” gelê Kobanê, şervanên YPJ û YPG’ê bi berxwedaniyeke bêhempa nefes li çeteyan çikandin pê re jî şikandina dîrokî ya çeteyên DAIŞ’ê dest pê kir. Herwiha di 26’ê Çileya 2015’an de ala serkeftinê li asîmanê Kobanê livlivî.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Di dawiya sala 2014’an de li tevahiya herêmên Sûriyê tevliheviyeke mezin rû da. Ew sala sêyemîn a şerê navxweyî bû ku ji aliyê hin dewletan ve dihate rêvebirin. Ji aliyekî ve Tirkiyê bi serokatiya Erdogan hewl dida komên çete yên mîna El-Nusra, Ehrar El-Şam û DAIŞ`ê li dijî Şoreşa 19’ê Tîrmehê a ku ji aliyê pêkhateyên Bakurê Sûriyê ve bi pêş ve diçû, bi kar bîne û desthilatdariya Sûriyê bixe destên wan. Li aliyekî din jî rejîma Esed a rûxandî bi alîkariya Hizbullaha Lubnanî dixwest çekdarên opozîsyona Sûriyê ji gelek bajarên Sûriyê derxîne. Di nava demên ku Sûriye ber wêraniyê ve diçû û tu hewldanên navdewletî yên rawestandina vê pevçûna bixwîn derneketin. Çeteyên xwedî mejiyên tarî ku ji xwe re kuştin, şewitandin û serjêkirina gelê Sûriyê kiribû awayê desthilatdariyê, diranên xwe tûj dikirin, ew jî çeteyên DAIŞ bûn. DAIŞ`ê ku wê demê ji hejmareke pir kêm pêk dihat, di demeke kurt de qadeke fireh a Sûriyê û Iraqê dagir kir. Di nava çend saetan de bajarên mezin ên mîna Mûsil a Iraqê û Reqaya Sûriyê ketin destê DAIŞ’ê. Di heman demê de mezintirîn baregehên Sûriyê û Iraqê desteser kirin, wê demê aloziya Sûriyê kete pêvajoyeke din.

**Kobanê cîhan ji hovitiyê rêzgar kir**

Pêvajoya ku bi Bihara Gelan a ku sala 2011’an de, dest pê kir, li Rojava veguherî qonaxeke şoreşgerî. Berxwedana herî sembolîk a vê şoreşê ku bi berxwedana hevpar a gelan pêk hat, Kobanê bû. Kobanê wek cihê destpêkê yê ku çirûska şoreşê lê pêket, bi welatparêzî û dilwêrekiya xwe tê nasîn. Ji salên destpêkê yên Şoreşa Rojava û heya roja me ya îro rastî gelek êrişên dijwar hatiye. Êrîşa herî mezin û giran di 15’ê Îlona 2014’an de pêk hat. Çeteyên DAIŞ’ê ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve ji her alî ve hatibûn amadekirin, çawa ku bi baweriyeke kor a îslamê ve êrişî Şengalê kirin û komkujî pêk anîn, bi heman şêwazî û bi amadekariyeke xurtir berê xwe dan Kobanê. Xwestin tola binkeftina xwe ya li Şengalê, bi dagirkirina Kobanê re ragihînin û bi vî rengî çirûska şoreşê vemrînin. Lê li hemberî vê êrişa talankirin û dagirkeriyê gelê Kobanê, şervanên YPG û YPJ’ê bi rihekî hevpar berxwedaneke bêhempa nîşan dan. Gelê Kobanê ku cih û warên xwe bernedan, ji cîhanê re bûn mînaka herî berbiçav ku çawa li dijî hovîtiya DAIŞ’ê tê şerkirin. Berxwedana Kobanê ya ku veguherî berxwedaneke giştî ya kurdan, careke din ji mirovahiyê re bû hêvî. Bi berxwedana Kobanê re hemû gelên cîhanê dîtin ku hîna jî hêzeke dînamîk heye li dijî zilmê û



dijminên mirovahiyê şer dike.

**Şerê man û nemanê li dijî çeteyên DAIŞ’ê bilind kirin**

Êrîşa DAIŞ’ê li dijî kantona Kobanê di 15`ê Îlonê de dest pê kir. Şervanên YPG û YPJ’ê li her gundekî berxwedanên bêhempa nîşan dan, da ku welatiyên gundan biparêzin û wan bigihînin herêmên bi ewle. Lê çeteyên DAIŞ’ê hêzeke mezin anîbû. Herwiha Kobanê ji hemû aliyan ve dorpêçkirî bû, lewra DAIŞ’ê di destpêka Cotmeha sala 2014’an de, zêdetirî 300 gund û hinek taxên bajarê Kobanê jî dagir kirin. Di encama êrişê de 300 hezar sivîl malên xwe berdan û çûne bajarê Pirsûs ê bakurê Kurdistanê û li wir mertalên zindî çêkirin, da ku komên çete ji aliyê sînor ve nekevin taxên bajêr. Di vê navberê de gelek ciwan û xelkên bajêr jî li taxên xwe man û li kêleka şervanan şerê man û nemanê li dijî çeteyên DAIŞ’ê bilind kirin. Ji bo şervanên YPG`ê û YPJ`ê ku li hin taxên bajêr çeperên xwe çêkin, tenê yek bijarte hebû; ew jî berxwedanî bû. Bi çekên xwe yên sivik 21 rojan li ber xwe dan û rê nedan çeteyên DAIŞ’ê ku li bajêr bi pêş bikevin, heta ku balafirên hêzên hevpeymanê hatin û çeperên çeteyan yên li bajêr bombebaran kirin. Wê çaxê şervan jî bi pêş de çûn û hin taxên bajêr rizgar kirin.

**Çeteyên DAIŞ’ê li Kobanê rastî mertalên zindî hatin**

Êrişa li ser Kobanê di demeke de pêk hat ku ji Îraqê bigire heta Sûriyê û heta tevahî welatên cîhanê li hemberî hovîtiya DAIŞ’ê bê çare mabûn. DAIŞ bêyî ku tu hêzê li pêşiya xwe bibîne diket kîjan bajaran tar û mar dikirin û komkujiyên mezin pêk tanî. Ango ji bo tevahî cîhanê metirsiyeke mezin ava kiribû. Bi vê hêrsê berê xwe da Kobanê. Lê li Kobanê rastî mertalên zindî hat. Rastî berxwedana dîrokî ya şervanên YPJ, YPG’ê û hêrsa gelê Kobanê hat. Çawa ku çeteyên DAIŞ’ê Kobanê ji çar alî ve dorpêç kiribû. Gelê Bakurê Kurdistanê jî li dora Kobanê xelekek ji piştgirî û berxwedanê ava kir. Rojane pêl bi pêl keç û xortên Bakur, Rojhilat û Başûrê Kurdisatnê berê xwe dan vê cenga giran.

**Berxwedana Kobanê cîhan matmayî hişt**

Li hemberî berxwedana li dijî çeteyên DAIŞ’ê ya ji hêla şervanên azadî û aştiyê ve dihat kirin ku nîvê wan jin bûn, cîhan mat mayî ma. Ev berxwedanî dengvedaneke navnetewî di astên fermî û nefermî de çêkir. Kobanê bû sembola berxwedana gelekî li hemberî hovîtî û tarîtiyê.

**Di 26’ê Çileya 2015’an de ala serkeftinê li asîmana Kobanê livlivî**

Di 26’ê Çileya 2015’an de alên Yekîneyên Parastina Gel li girê Kaniya Kurdan li Kobanê hatin rakirin. Ew dîmen bûn nîşaneya serkeftina Kobanê li dijî çeteyên DAIŞ’ê û piştevanên wê. DAIŞ cara yekemîn li Kobanê têk çû.

**Şerê gel li kobanê bi serketinê tacîdar bû**

Berxwedana Kobanê berxwedaneke ku gel bi derfetên xwe ava kiribû. Ji 7 salî heta 70 salî gelê Kobanê bi zarokên xwe re bi tevlîbûna li çeperên şer berxwedanê pêş xistin. Tevî ku bi rêxistineke hov a weke DAIŞ’ê re rû bi rû mabûn jî, gelê Kobanê bi şervanên xwe re bêyî kêliyek dudilî bijîn heya ku bigihîjin serkeftinê şerekî bêhempa dane meşandin. Êdî veguherî şerê gel û şerê gel bi serketinê tacîdar bû.

**Şikandina dîrokî ya çeteyên DAIŞ’ê li Kobanê dest pê kir**

Her kuçeyeke bajarê Kobanê, bi dehan destan tê de hate nivîsandin. Vê destanê tevahî gelên cîhanê herikande qadan û bi sedan ciwanên enternasyonalîst berê xwe dan Şoreşa Rojava. Ango berxwedana Kobanê bû pirek di navbera gelên bindest ên Rojhilata Navîn û cîhanê û ruhekî gerdûnî bi xwe re ava kir. Ruhê ku li Kobanê hate jiyankirin, ruhê Şerê Gelê Şoreşgerî bû. Ev ruh di kêliya herî kirîtîk û xeter de zafer bi dest xist. Dengê kenê şervanan, dengê stranên lehengan û hêrsa tolhildanê di kêliya ku hat gotin; “Kobanê ket, va ye dikeve” nefes li çeteyan çikandin û şikandina dîrokî ya çeteyên DAIŞ’ê dest pê kir.

**Armanca DAIŞ û Tirkiyê cihê şoreşê tune bikin**

Dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ’ê xwediyê heman armancê bûn, armanc jî ew bû ku bajarê ku Şoreşa 19’ê Tîrmehê lê dest pê kiribû, tune bikin, da ku Rêveberiya Xweser di hêla leşkerî û siyasî de bibûya derbeyeke mezin û DAIŞ’ê deriyê sînor ê Tirkiyê jî bixista bin kontrola xwe.

**Rêber Apo jî, ji bo êrişa çeteyên DAIŞ’ê li ser Kobanê ev nirxandin kiribûn**

Rêber Apo di hevdîtina xwe ya 21’ê Mijdara 2014’an de ya bi şandeya Îmraliyê re pêk anîbû, bal kişandibû li ser giringiya berxwedana li dijî DAIŞ’ê û gotibû: “Kobanê di sedsala 21’emîn de mifteya çareseriya hemû pirsgirêkan e, dikare hemû nakokî û şeran çareser bike. Divê Kobanê bê parastin. Li wir berxwedaneke destanî û lehengî tê nivîsandin. Hemû gelên me ku xwedî li wê berxwedanê derdikeve bi hişmendî û rûmet tevgeriyane.
Rêber Apo diyar kiribû ku ji bo siberoja demokratîk a Rojhilata Navîn aştiya herêmê girîng e û ev nirxandin kirbû: “Ez carek din berxwedana rûmeta mirovahiyê Kobanê û hemû gelên li welatên cîhanê ku piştgiriya xwe nîşan dane, silav dikim. Li Kobanê darbeyek tê plankirin. nêzîkatiya erebbûnê di Erdogan de heye û ev gelek talûke ye. Dixwazin Efrîn û Kobanê bi ereban girê bidin. Cizîrê jî bi Başûr girê bidin. Li ser Mûsil û cihên wek wê ketine nava hesabên gelek talûke.”
Rêber Apo di hevdîtina 4’ê Sibata 2015’an de jî serkeftina azadkirina Kobanê pîroz kir û got: “Hevdîtinên me li vir nebûna wê DAIŞ’ê her alî bişewitanda û talan bikira. Min gotibû bi ser Kobanê re dikarin mekanîka darbeyê bixin dewrê. Em ê jiyana azad di şexsê Kobanê de û jiyana nû bi giyanê berxwedana Arîn Mîrkanan ava bikin.”

**Gelê kurd dagikerî û teslîmiyetê qebûl nake**

Bê guman îro careke din di serî de Kobanê û tevahî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi heman xeteriyê re rû bi rû ye. Rojane dewleta Tirk a dagirker bi hevpeymanên herêmî û navdewletî êrişan pêk tîne û bingehê êrişeke bejayî amade dike. Dixwaze xwenên xwe yê Osmaniyan pêk bîne, lê gelê kurd bi tu rengî dagikerî û teslîmiyetê qebûl nake, lewra bi ruhê seferberiya Kobanê kar û xebat li kêleka hêza QSD’ê berxwedaniyên dîrokî tê meşandin.

FENER



## Bêalîbûn; gayê zexel e timî li mexel e

**Idrîs Henan**

Dewleta Tirk a dagirker êriş û dijatiya xwe li ser destkeftiyên gelan li Bakur û Rojhilatî Sûriyê bi hemû hêza xwe dewam dike. Faşîzm û çeteyên wê hewl didin bi rêya komkujî û sûcên şer gelê Kurd li ber rûyê cîhanê qir bikin û li ser tunebûna wî konseptên xwe bi cih bînin. Lê mixabin; raya giştî jî bê helwest e û bêdengiya wî jî raftarên dijminane yên faşîzma Tirk rewa dike. Lew re jî, berxwedana gelan bi serperştiya gelê Kurd û projeya wî ya demokratîk, bi ruhê seferberî û hevgirtinê li dijî van planên dagirkeriyê bê navber didome û rojane rûbirûkirina van xeteriyan re jiyana xwe dewam dike. Bi gotineke din, terzê jiyana Şerê Gel ê Şoreşgerî veguheriye modêlekê misogerkirina jiyana azad û wekhev. Ji ber vê jî, ancax ev modêl xilasker be ku siberoja têya payîn tekûztir bibe.
Piştî ketina rejîma dîktator a Esad, li Sûriyê qerebalixek desthilatdariya feudal çêbû. Paralelî wê yekê jî şandeyên herêmî û yên navneteweyî yên aborî, siyasî û ragihandvanî, bi mebestên cuda cuda, berê xwe dan Şamê. Hemû jî hewl didin rûyê vê desthilatdariya nû ya xwedî kokên selefî ya tundrew, vebiriqînin ku hewl didin weke bijardeyeke rêveberiyê ya qaşo guncaw û tekane li ser stûyê gelên Sûriyê tivî bikin. Bi vê yekê re jî hewl didin rê li ber çi projeyên demokratîk bigirin. Bi gotineke hê rasterast, dixwazin tekane projeya demokratîk a modêla Rêveberiya Xweser ku li Bakur û Rojhilatî Sûriyê di meriyetê de ye ji nav bibin û bi rêya şer û êrişan biratiya gelan qir bikin. Lew re jî bi rêbazên ferzkirin, şîdet, vebiriqîn û restorekirina terora DAIŞ, dixwazin rêveberiya welat mande bikin û îradeya gelên Sûriyê bi metodên destpotiyê desteser bikin.
Çi civînên di bin navê piştgiriya gelên Sûriyê û rakirina sizayên navneteweyî yên li ser Sûriyê li dar dikevin jî, hîkaye ne. Armanca wan a cewherî ew e ku navê HTŞ û lîderên wê ji lîsteya terorê werin rakirin. Îcar dixwazin vê teoriya xwe bi zorê bi gelên herêmê bibin qebûlkirin ku bineya wê jî şerê navxweyî ya gelan e.
Ji ber vê zihniyeta parçeker ku li ser tunebûna gelan xwe dide jiyîn, îroj li Bendava Şehîdan – Tişrîn – berxwedana gelên azadîxwaz û demokratîkxwaz di lûtkeya xwe de ye. Ango; îroj li wê herêmê destan û efsaneyên çandên cuda cuda ji nû ve tên nivîsandin û pozê wê teoriya faşîst bi erdê ve dûz dikin. Bi gotinek din; îroj li Tişrînê, bi vîna gelên xwebexş û berxwedêr govendên azadiyê tên gerandin û rûyê kirêt ê desthilatdariya dixwazin li ser me bidin ferzkirinê, têye deşîfrekirin.
Li Tişrînê hemû maskên hêz û aliyên berjewendiya xwedanmaliyên taybet û destwerdanê hatin xwarê. Dixwaze tevger, partî, rêxistin, sazî û dezgeh be, dixwaze akademisyen, rewşenbîr, nivîskar û rojnamevan be. Hemû jî bi yek qêrîna berxwedanê hilweşiyan û tenê vîna ewladên gelê şoreşger li holê ma. Çîrokên metafîzîk, liberal, arstokrat û borjua ku bi bayê keştiya moderntîteya împeryalîst re dizivirin, li ber estetîka karakterê Şerê Gel ê Şoreşgerî ku li Bendava Şehîdan – Tişrîn – xwe daye der, bê wate man û badilhewa çûn. Bêalîbûna ku hewl tê dayîn were raberkirin, fena Kurdan gotiye; Gayê zexel e timî li mexel e.
Êdî gelê me, di şexsê her pakrewanekî rêya azadiyê de, bi heqîqeta xwe re bûya yek beden. Çi helwest û hizirîneke ku şiyana berxwedêran dike mijara nîqaşê, dijatiya rasterast a ji îradeya gelê şoreşger re.